Derçûn ji desthelata manayê

Hoşeng Şêx Mihemed

Helbest û Wate

Renge yek ji arîşên balkêş sebaret bi helbest û helbestê ew be, ku helbest bir rengekê seyir, ji çapemeniyên deverê hatiye dûrkirin. Renge hijmarên pertukên helbestî ji pertukên dî kêmtir hatibine çapkirin. Diyare çapkerên pertukan dibêjin me divê pûtey bidin vekolîn, rave, roman, çîrok û babetên dnz yên hizirî.

Bi ankoyeka dî, ew dibêjin ku helbest, peywendî bi hizirê ve nînin û berhemê helbestî wek berhemek hizirî nahête temaşakirin.

Lê bila bipirsîn helbest çî ye? Peywendiya helbest û hizirê watayan çî ye?

Aya helbest valaye ji hizirê..?

Bila em bi nimûnên sade dest pê bikin, gelek caran demê mirov li keş, hewayekê xweş, serbest û azad dabe, dibêje; keş û hewayekê şairî bû! Diyare ev (şairî bûne) girêday helbestnivîsînê yan helbestxwandinê nîne di wî demî de, ku ew mirov tê de tena, azad, serbest û kêfxweşe, diyare di vê derê de şairî bûn.. Bi ankoya vê çendê dihêt ku peywendiya mirov, çemik û babetan, peywendiyek tijî mirovayetî, ciwanî, estetîka, aramî, xweşî, çêj, lezet, tenahî, dilniyabûn û aramgirtinêye. Aneku mirov di lehzekê de ku tebayî ye li gel dunya û jiyanê, mirovî li hember çemk û babetên dunyayê manayên ciwan, xweş û lezetdar yê çêkirîn û berhem hînan.

Başe ew manayên xweş û lezetdar.. Çewan dihêne berhemhînan..?

Diyare, bo her peywendiyek mirovayetî, mana pêwîste. Di navbera mirov û babetê beramber mirovî, vêca bila babetê beramber bê mana jî be, bê manayîbûn jî manaye wê gavê. Ew mana jî bi rêka peywendiyê çê dibe, peywendî jî bi hestan û hizra mirovî, her wesa layena ruhî jî naçêbe em ji bîr bikin, çunke hizir , hest û ruh pêk ve sîstemek hizirî bo mirovî çêdikin û mirov jî bi wî sîstemî peywendiyên xwe li gel dewrûber û babetên beramber diyar dike û manayan dide, nasname û pênasan bo çêdike.
Renge em bizanîn hizir û hest, yekser dişên manayan çêkin û bidene me, bo nimûne mirovek dê karekî encam dide û dizanîn ka ew kar başe yan xirab, yan tiştekî digirîn dizanîn germe, yan sar, xweşe, yan nexweş, hizir û hest.. Zû manayan didene me, manayên diyar û aşkira, lê renge helbest ta radekî cuda be, renge ew hizra baş û xirab.. Hestên xweş û nexweş bide me.. Lê em zû bi zû manayên wan hestan nizanîn, aneku (başî û xirabî, xweşî û nexweşî) wek dû babetên berhingar zehmete di helbestê de bişên xwe bikine berhem, di helbestê de ew mesafe di navbera baş û xirabiyê de, xweş û nexweşiyê de heye, pitir û pitir fireh dibe, dibe erdek tarî û pêwîst be mirov lê bigere, di wî mesafey di mana bi sanehî nahêne dîtin û aşkirakirin.
Aneku helbest heger neşêt zû bi zû manayan bibîne û berhem bihîne. Heger ew e, ew di vî mesafey de hatin û çûnê dike û digere.. Ev mesafe jî berdewam tijî nihênî, sihir û serab dibe. Berdewam mirov tê de digere û her manayekî dibîne dibe serab û nabe heqîqetek reha.
Anku helbest dijî stiratîja (qise hezare, duwanî bekare) şuxil dike. Li cem helbestê hemû qise li karin û dişên xwe nimayiş bikin, helbest, manayeka dûmahî berhem nahîne, da bo me baweriyekê li ser babetekî çê bike, diyare di vê derê de jî ewa dişê (hizar qesan) çê bike, hizir û hesteka berdewame ku li ast çi mana û heqîqetan naraweste û berdewam digere, aneku helbest hizra berdewama mirovî ye.
Lê aya di vê derê de di navbera hizir û ruhê de çi peywendî heye? Diyare hizir, verêjê hestên mirovî ye.. Û her wesa soz jî dîsan piştî dîtin, bîstin, tamkirdin, bonkirdin, destlêdanê peyda dibin û mirov dirik pê dike. Coreha hest û soz bo mirovî çêdibin, û coreha mana jî mirov peyda dike, demê mirov neşiya bibe xwedan qenaetek bê guman, û nihêniyên hemû tiştan bo aşkira nebûn û neşiya peywendiyên xwe li gel hemû tiştan çê bike, di vê derê de ev mesafe dest pê dike, ewa di navbera cemserên cotên berhingar.. Di navbera xweşiyê-nexweşiyê û başî-xirabyê, di vê derê de ku mirov neşêt manayên heqîqî destnîşan bike, bersivên yeqînî peyda bike. Ruh di

vê derê de, bingehê pirsçêkirinê ye ku berdewam hest û sozan çalak dike da pitir hizran berhem bihînin û manayên nû peyda bikin, bersivên nûtir pêşber bikin û dîsan jî gumanên dî û geryanên dî daxwaz bike, aneku ruh ku serkaniya vê geryanê û soranêye, mesafa di navbera heqîqet û gumanê de ye, nihênî û aşkirakirinêye.. Pirs û bersivêye û peywendiya wî bi hizirê ve ew e ku berdewam daxwaz dike.. Hizir wek çalakiyek mirovayetî berdewam xwe nû û nûtir bike û li çi astên mebestgerayî û manadariyan neraweste, berdewam nefiya manayan bike, aneku helbest berdewam manayan çêdike û tecawza wan jî dike, mesafeka bê dûmahiye di navbera babetê hevdij û cotên berhingar û têkşikandina wan sîstemên hiziriye ku berdewam bo serê cemserekî ji hevdijiyan dikene xar û li ser manayekî dirawestin wekî berdewam dîn, siyaset, felsefe û zanist dikin.

Aneku ew kayeyên dî, çendî ji helbestê dûr bin, hinde jî ji heqîqet û yeqînan nêzîkin û helbest jî wek kayek hizirî û ruhî, her dem dûre ji heqîqetê û yeqînan, helbest jî çi caran manayên diyar û aşikira berhem nahîne û xwe nade dest çi heqîqetan.

Bi vê ankoyê, helbest, pêwîste tijî helbest be, da bişêt dunyayê tijî helbest, ciwankarî, sefer, geryana hizir, firîna hestan û sozan bike.

Di vê derê de helbest, cudaye ji kayeyên dî, çunkî ne dîn û ne siyaset, neşiyan dunyayê di helbestê de nigo bikin, lê eve xerîke helbesta hevçerx vê çalakiyê encam bide.

Helbesta hevçerx û derçûn ji desthelata manayê

Derçûn ji desthelata manay derçûne ji sîstemên hiziryên tijî mana û bersiv û yeqîn, desthelata manay.. Desthelata sîstema hizra manaxwaz û xwedavende.. Derçûn jê.. Derçûne ji dîtin û têgehiştinek pir qenaetên hazir.

Heger me bivê vekolîna desthelat û peywendiya mirov û çemkan bikin, divê em binemayên wan helbestan û berheman biniyasîn, ka xwedan çi binema û şengistene û li ser çi sîstemên hizirî hatîne avakirin. Heger herdû binemayên dînî û siyasî bo mawekê helbest bi rê ve birin û çendîn têkistên tijî mana û yeqîn dane me, eve vê gavê renge corek nû ji têkistên helbestî ji dayik bûbin ku mana tê de gehiştibe astek lawaz û pitir helbest di helbestê da berhev be. Lê renge xwandina helbesta nû û nasîna wan ji yên berî bi zehmettir be, çunkî binemayên wan berheman binemayên cuda û hemerengtirin.

Berî her tiştekî divê ez bibêjim; demê dibêjîn helbesta hevçerx yan yê nû, bi ankoya berhemê sîstemên hizirî yên nû û hevçerx, aneku cuda ji sîstemên hizir yên dînî û siyasî.
Di vê vekolînê jî de, ez li wan sîsteman digerim ne wek li navan, bo min ew giringe ku berhemê wan çend dişê sîstema wan ya hizirî bo me aşkira bike, berhemên helbestî bi taybetî, her wesa gotar, dîdar û qesekirinên tiyorî jî heger hebin, lê bi taybetî helbest, çunke helbest piraktîka wî sîstemî ye ku helbest neşê wêne û şêwaza wî sîstemî biguhure. Bo nimûne, heger sîstemê hizirî ya şayirekî dînî be, eve neşê baweriyê bi me bihîne ku ew miroveke xwedan sîtemek hizirî. Ne dînî, çunkî wekî me li cihên dî amaje pê da, rexne neşê me bixapîne û berhem jî dîsan neşê ji verêja babetekî biçe dunya û babetekê dî, xwandevan, dişê wan binemayan bibîne, destnîşan û aşikira bike. Berhemê helbestî, aşkirakirina sîstema hizir ya çamebêjiye, çunke demê mirov, xwedan sîstemek hizirî be berdewam manayan çê bike, dê di helbestê jî de berdewam manayan çê bike.
Aneku derçûn ji desthelata manay, bi pileyek azadbûne ji binemayên dînî, siyasî, hizirî, felsefî û zanisitî yên ku bersivên yeqînî didine mirovî.
Helbesta nû mirovek nû û sîstemê hizirek nû ye,
Helbesta hevçerx, berhemê sîstemek hizirî hevçerxe.
Aneku nûxwazî û hevçerxî bi tinê girêday edebî nîne wek hindek nivîser têdigehin, belkî girêday dîtina nivîseriye bo dunya, jiyan û hebûnê hemûyê.
Ji ber vê çendê jî berhemên helbestî, dişên rastî û direwiya gotin û qesên nivîseran nîşanî xwandevanî bidin. Berhem bi xwe dişê ruha nivîserî reng bike.
Nivîser heger xwedavend bû.. Çend pêkol bike ku berhemê wî azad be, neşêt ne azad bike, ne bi azadî nîşanî me bide, çend bivê ji desthelata manayan derbaz bike, neşê çunke mesele sîsteme, ne wek viyan, ewa şayirî divê bibêje, cudaye ji verêja hizra wî, bi rengekê ku heta direwan jî bike ku wextekî wesa baw bû.. Şayirê zîrek, direwînê zîreke lê ew sîstem dişê bibêje me ev qese ne ya mine û ji berhemê min nîne.
Her bo nimûne.. Heger helbestvanek bibêje: "Helbestên min ji binemayên dînî valane" lê demê em dibînîn helbestên wî tijî manayên yeqînî û bersivên bê gumanin, em bi sanehî dişên aşkira bikin ku ew şayir xwedan binemayek dîniye.
Yan heger helbestvanek bibêje; "Ez helbesta hevçerx dinivîsim" û

em bibînîn berhemên wî nigûne di siyasetê de, di manayên siyasî de, eve em dîsan bi sanehî dişên bibêjîn: Keko temaşa sîstemê xwe yê hizirî bike!

Mirina nivîserî

Mirina nivîserî: Aneku mirina wan manayan ewên nivîserî dayine berhemî, aneku ew manayên ji encama peywendiya nivîser, tişt, babetan û hebûnê çêbûyine, demê nivîser dimire, aneku çi peywendî di navbera berhemê helbestî û sîstemê hiziriya nivîserî nemabe, lê aya berhemek heye ku şiyabe peywendiyên xwe li gel binemayên hizirî û ruhiya şairî biqetîne? Heger hebe wê gavê nivîsînê çi peywendî bi nivîserîve namîne û nivîser dimire.. Lê aya helbest dişê peywendiya xwe bi nivîserî û binemayên wî yên hizirî û ruhî biqetîne?

Di vê derê de em digehîne satê berhemê azad ku bi rehendên xwe yên hunerî, hizirî, ruhî û gumankî dişê bibe rûberek berfireh bo amajên firerehend û cureha rengên nihêniyan.

Aneku berhem bersivên cora û cor û gumankî bide kiryara rave, rexne û xwandinê, ji layê nivîserî ji manayek, yan çend manayên diyarkirî rût bû bê, rû bi vê ankoyê ku xeyala xwandevanî azad bike û rêkê lênegire çewan tê de hizir bike, guman bike û nihêniyan aşkira bike, xwandevan ew bi xwe bibe xwedanê berhemî û peywendiyekê di navbera sîstemê xwe yê hizirî û berhemî çê bike, wê gavê xwandevan dişê nivîserî bikuje.

Aneku berhemê helbestî ew e ku bişê, yekem car peywendiya xwe li gel nivîserî biqetîne û peywendiyeka nû li gel xwandevanî çê bike. Wê gavê nivîser dimire û xwandevan ji dayik dibe ku eve jî taybetmendiyeke bo helbesta azad û derçûy ji desthelata manayan.

Aneku berhem bişê ji sîstemekê hizirî baz bide ser sîstemek din ya hizirî, li ser çi binemayên diyar û aşkira nerawesite û berdewam peywendiyên cora û cor û hemereng li gel sîstemên cuda cuda çê bike.

Bi vê çendê jî helbest dibe xwedan desthelatek taybet bi xwe ve û dunya xwe ya xweser çêdike û nakeve di bin çi sîstemên hizirî de. Ew bi xwe sîstemekê taybet bi xwe ve bo xwe xeliq dike.. Dûr ji desthelata nivîser û manayên wî. Sîstemek helbestî, tijî helbest û ruh û rewan.

Heger mirina nivîserî derbazbûn nebe ji sîstema hizirî û ruhî, eve ev gotine dibe gaziyek bê binema.